

STÊRK

Bijartina: Serdarê Bedirxan

Navîna meha Hizêranê, min di malpera nefel.com ê de, parçeyeke wêjeyî ya wergerandî, bi navnîşana "Name ji aşê min-Stêr, çîroka şivanek provenceyî" ku ji bal birêz **Husên Mihemed** ve hatiye wegerandin xwend.

Piştî ku min ev çîroka xweş û nirxbuha xwend, yekser hate bîra min ku min ev çîrok berî derdora 25 salan di **Hawrê** yan **Ronahî** yê de bi pênûsa hêja **Dr. Nûredîn Zaza** xwendiyê. Ez li Hejmarên Kovara Hawarê vegeyriyam, min ew di hejmarê 33an de, lê çiriya pêşîn 1941an de dît. Careke din, bi hûrbînî min ew xwend, ji min ve hate xuyakirin ku birêz **Dr. Nûredîn Zaza** bi navê (Nûredîn Usîf) di sernivîsa çîrokê de daye zanîn ku ev çîrok ya wêjevanê Firensî yê kilasîk **Alfons Daudet** e (1840-1897). Ji bo ku ew çîrokê bêtir nêzikî hiş û warê Kurdan bike, wî navê çiyayê **Luberoll** bi çiyayê **Sîpanê Xelatê** guhertiye, navê keça axê ya bedew û çeleng **Stîfanê** jî kiriye **Mijgan**, digel hin guhertinên din, ango wî (teseruf) tede kiriye.

Ji bo xwendevanên me vê kurte-çîroka xweş a wergerandî bixwînin, min ew ji rûpelên Hawarê guhestiye ser rûpelên **NEWROZê**. Herweha, ew dikarin wergera birêz **Husein Muhammad** a hêja jî di malpera [nefel](http://nefel.com) ê de bixwînin. (**Serdarê Bedirxan**)

STÊRK

ADAPTATIONS DE "LES ÉTOILES"
D'ALPHONSE DAUDET

Gava li zozanên **Sîpanê Xelatê** min pezê xwe diçêrandin, carina hefteyî diborîn bêyî ko ez dengê tu insanan bibihîsim. Ez bi tenê bi hevaltiya kûçik û pezê xwe bûm. Lê, her serê panzde rojan carekê gava ji dûr ve min dengê zengilên qantirên me dibihîst ji kêfa xwe serê xwe radikir: Gundiyekî, yan kebanîya mala axê ya pîr ji min re zadê min ê panzderojî tanî.

Wê rojê, ez çiqêşa dibûm; Min ji wan nûçeyên gund dixwestin, lê tiştê ko ez ji her tiştî bêtir dilxweş dikirim pîrskirina halê **Mijganê**, **Mijgana** keça axê bû.

Bê ehemiyet min ji wan dipirsî: Gelo xanima piçûk pîr diçe dawet û şahînetan yan na? Qet

dikeve govendan? Cilên spehî li xwe dike? Eger ji min re bigotana: "Ma ji te re çî? Şivanê reben û belengaz!" Minê li wan vegeyriya ko ez gihame bîst salî û min hîn di spehîtiya wê de tukes ne dîne!

Rojeke Înê ez li benda zadê xwe bûm; Berî nîvro baraneke xurt hat. Heya piştî nîvro çavên min li rê bûn, pişt re min hêviya xwe birî û ji sêrmê ketim holika xwe. Esrê, min dengê zengil bihîst; Zûka derketim derve; Çi bibînin... bizanin kî?... **Mijgan!** Xanima min bi xwe bû...

Li ber holikê peya bû. Ji bayê çiyê hinarkên wê bûbûn sorgul. Li min vegeyriya û got: "Gundî mijûl bûn: Pîrê jî çû bû cem zaroyên xwe bavê min ez şandim..."

Mijgan, bi bejna xwe a zirav û narîn, bi çavên xwe ên çeleng û bi cilên xwe ên xemilandî û giran û giran, spehîtiya bi xwe bû. Ciyê wê bajar, xaniyên delal û îşê wê govend, reqs û stran bû, lê ne çiya, zozan, rêl û qantir bûn.

Mexlûqa çeleng! Çavên min jê ne dibûn. Cara pêşîn min ew ji pîr nêzik didît. Niha ew li ber min sekinî bû û bi tenê ji bona çavên min bû.

Dilê min hildavêt, hişê min diçû û qirika min dihat girtin.

Mijgan zad ji selikê derxist û da min. Pişt re bi nêrînên tûj li dora xwe nêrî, da ko ji giyan şil nebe hinek fistanê xwe rakir û çû holika min; Min da pê wê. Li hundir, li ciyê raketina min, li bilur, kulav û li darê min nêrî, pişt re bi dengê zîz û ahengdar gote min: "Tu li vir dijî ne? Şivanê reben! Niha tu bi tena xwe ji diltengiyê çiqas bêzar dibî? Bêje min: Tu çî dikî? Bi çî mijûl dibî û kê tîni bîra xwe?...". Minê jê re bigota; "Bi tenê te xanima qeşeng". Dilê min derew ne dikir; Lê zimanê min negeriya û ez sor bûm.

Mijgan bi eza min hesiya û xwest hîn bêtir min bêşîne, "Hevala te a delal çima carina nayê çiyê û te nabîne?". **Mijganê**, gava ev pîrs digotin serê xwe dikir paş û dikenî; Min digot qey periya spehîtiyê bi xwe ye!

Lê hatina wê weke xewnek bû. Piştî demekê gote min: "bi xatirê te şivano". Bi dilekî şikestî min jî got ê: "Xwedê bi te re be xanim!" pişt re selikên xwe ên vala avêtin ser qantirê xwe, lê siwar bû û bi rê ket.

D.R (7)